Nûjenî ango afrandin di helbestê de

Mesûd Xelef

Helbest an ku peyvên ciwan û tijî hest, ne ji valatî, ne ji êş û ne jî kêfxweşiyê dihê weku ku em gelek dihîzirin, lewma çi cara nivîsîna peyvê ji valatiya naxê mirov an ku êşên kesyatî nahêt, belku ew hemû bi xwe tevlîheviyeke hiziriye. Vêca ev hizir çi bi rêk û pêk hatine daraştin, an jî mîna komeke rengên germ hatine ber çavên me, wî wextî em dibêjin û şîrove dikin an jî em bi xwe felsefekî jê re çê dikin. Lewma her kesê ku heye dihizire, wate hizira wî, wî bi me dide naskirin.

Hizira nû mirovê nû dide naskirin û em wî di riya wê hizirê de nasdikin, hizira kevin jî mirovê kevin dide naskirin, an ku ta çi radyî wî kesî kariye xwe biguherîne. Carina ew hizir dibe ku helbestek be, dibe ku çîrokek be, dibe ku di nava perên romanekî de be.

"Nivîsandin mozexane ye
Dîwarên xezînên wî diherifin
Û derûn di geryanê de toze
Tîrêje.
Tu dibêjî şer jî
Dest bi cot u avdanê kiriye
Û stiranan di qafên pehin de dibêje,
Dengê miriyan divegrîne
Û ponjînên wan di golekî hişk de." *(T.S. Aliyot)*

HELBEST

Gotin li vê derê eve, em kengî hizira nû dibînin, aya her peyveke bihête nivîsandin nûyatiyê bi xwe re dihîne, bê gûman em ê bibêjin nexêr. Ji ber ku nûyatî weke bihara vê sala ku em tê de ne, li hêviya biharêne ku em bibînin gelo wê çawa be. Helbet her yek ji me biharek di hizira wî de heye berî ku bihar bihê, lê em vê jî dizanin ku wê ev bihar ne weke ya sala çûy be, wesan jî helbest û nûjenî, an ku helbesta nû û rênmayên wê, gelek caran dema em dîwanekî helbestan dixwînin ku li van demê dawî derdikevin, an ku di kovar, rojname û malperên enternêtî de ji wan re dibêjin ku filan û bêvan helbestvanî dîwana xwe li gor helbesta nûjen nivîsandiye, an ku wê bibêjin ku tevlihev kiriye û kilasîk û nûjen kiriye şêwazek, lê ev pirsiyare nehête kirin: "gelo mirov dema wê dîwanê dixwîne, hizirekî nû, xemleke nû, cilekî nû dibîne yan ne?" Bê guman emê bibêjin 75% nûyatî tê de nîne belku çend hestên xweş û dilvekerin. Li vê derê, divê nivîskar û rewşenbîr hindekî objektîf bin, rastiya wan helbestan ji xwendevanî re derxin ne ku pesindar bin û ji bo dilê hev xweş bikin, helbestvan jî divê wê hizirê bike ku ew çi pêşkêşî xwendevanî dike, aya helbestê xwe pêşkêşî xwendevanî dike, an jî mezinatiya navê xwe.

Helbesta nû ewe ku em di nav de hizirên ku li pişt hizrên me veşartî bibînin û wê cîhana tevlîhev ji bo me aşkera bike, da ku rastî nemîne daleqandî, divê ew jî weku beşekî xwedî erk be di avakirina bîra civakê de tenê maye.

"Ji bo çi ditirsî ji mirinê,
Ma qey tu çi caran nemirî?
Ji bîra te çû, li mirina dûmahiyê,
Min bi ava kaniya Sipî tu veşûştî

Ji bo çi hez ji jiyanê dikî?
Salehan sale û tu dijî
Û hêj tu bi xwe xewnekî di rastyê de"

(nimûneyeke ji bo pêhisiyana nakokiya hizirî)

(*ji helbesta Ka destê te. Sebrî Silêvanî*)

Arîşeya helbesta kurdî ya herî serekî di vê qonaxê de ewe ku nikare nûyatiya xwe li gor nûyatiya civakê biguncînê, yan li paş civakê dimîne, yan jî bi kîlometaran ji civakê dûr dikeve, yan jî helbesta kolankî dihê nivîsandin û her kes dibêje ez yê herî nûjen im û yê herî baş im ku helbesta nûjen dinivîsim. Helbestvan bi gotina nûjeniyê ve xwe dixapîne, an ku bi xwe dide bawerkirin ku wî helbesteke nûjen nivîsiye.

Di encam de heger em bibêjin nûjenî , pêdiviye hizireke nû li gel xwe bîne, cîhaneka hizirî ya nû li gel xwendevanî biafrîne, valatiyekî tijî bike, bibe nimûneya hizirî ya ku di mêjiyê mirov de keftûleftê dike. Erk li vê derê ewe ku ew nivîskar jê re nav deyne ne ku nav ji bo peyda bike û ji derdoran bîne.

HEVBESTÎ